



K. V. Vertyayêv

1

DÎROKA KURDISTANÊ

KRONOLOJÎYA BÛYERÊN SEREKE
YÊN DÎROKA KURDAN JI DEMÊN
KEVINARE HETANÎ DESTPÊKA
SEDSALA XX

Reng û rûyê etnîkî yên gelê kurd bi tevahî ji demên kevnare û heya roja îro hatîye parastin. Bandora gelek gelên Asîya Roavayê û Rohilata Nêzîk li ser avabûna kurdan wek netewe hebûye, ku piraniya wan di zû da ji rûbarê dinyayê hatine hilanîn, nemane. Di dîroka esilê kurdan da, wek ku di dîroka gelek dewletên Mesopotamiyayê da, hela gelek deqên sipî hene. Zanyar gerekê li ser bingehê lêgerînên arkêologiyê û wergerandina dest-xetên kevinare wê kêmaniye bidine hilanîn. Paytextê dewleta Mîtanîyan a kevinare (sedsalên XVI – XIII berî Zayînê) bajarê Vaşşûkannî (Kurdistana Rojava) hetanî niha jî li benda lêkolînan e, kompleksa megalîtîk Göbekli Tepe (Tirkîye) ya di serdema neolîtîk da, rind nehatiye lêkolanê.

Pirsgirêka derheqa esil-esasê ênosa kurdan da heta niha jî cîyê minaqeşeyê ye. Şika zanyaran ser wê yekê tune, ku kurd bineciyên esilî yên Mesopotamiya Bakur in. Kurd wek mîlet berî weke ji du hezar û niv heta hezar û niv salan û vir da li ser axa xwe ku anaha ser dijîn peyda bûne — li rêzeçiyayên Zagrosê û hewza çemê Ferat ya mezin. Netewe û Împêratorî bi sedsalan û bi hezaran salan hatine û çûne û dîdema Kurdistana etnîkiyê ya niha saz kirine, nitirandine.



Salên 10000–4000 berî Zayînê

Serdema Neolîtê, vejînê ye. Li Mesopotamîyayê şoreşa xwelîbêcerkirinê qewimî: cara pêşin di dîrokê da li vira dest bi cotkirina erdê kirin. Di dema erdvekolanên li Kerîm-Şahirê li rex Kerkukê (Şanîdar-kerîm-çandinî-şehîr, sala 9000 berî Zayînê) li malan hebên genim hatine dîtin.

Sala 5000î berî Zayînê

Îzbatîyên ku meriv li Erbelê (Erbîla îroyîn) mane. Erbil (bi kurdî: Hewlêr. — Not ya redaktor e) yek ji bajarên cihanê yê herî kevinare ye, ku li wir meriv ji wan deman heta roja îroyîn dijîn.

Efsaneya derheqa xuliqîna kurdan da

Yek ji efsaneyên derheqa xuliqîna esil û esasên kurdan da di berhemeke êpîkîyê ya helbestvanê faris Fîrdousî ya bi sernavê “Şah-Name, sedsala X” da heye. Di wê da behsa wê yekê tê kirinê, ku çawa padîşah Cimşîdê ji binemala “Şahên esilî yên mirovatîyê” ji aliyê padîşah Dehaq da hate kuştin. Ser girmilkên Dehaq du mar şîn dibin, ku xwerina wan mejûyê merivan bû. Lema ji her ro du xort dianîne diwana qesira Dehaq bona wana bikujin û mejûyên wan bikine xwerina maran. Lê dused xort karibûn xwe xilaz bikin, ewana di şev nivê şevê da ji qesira Dehaq revîn. Nişteciyan herêmê mî û berx dane wan bona ebûra xwe bikin û ji wana soz hildan ku ewê herin çiya û banîyan bijîn û wê tu caran venegerin bona hêrsa Dehaq ranekin. Û wek tê gotinê, gelê kurd da dû wan û tevaya millet rabû ser piyan.

Mîtolojiya çîroka Fîrdousî bi eslê xwe va pir kevnare ye. Dehaq herwiha di mîtolojiya ermenîyan, turkan û tacîkan da jî heye. Ne dûr e, ku efsaneya derheqa Dehaq da ji dem û dewranên hukumdariya padîşahê Akkadîyan Naram Suen tê (sedsala XXIII, berî Zayînê).

Di çavkanîyên Akkadîyan yên sedsala XXIII berî Zayînê herwiha navê eşîreta Menda derbaz dibe, ku akadîyan şerê wan dikirin. Wisa xuya ye, ku esilê van eşîretan hindawropî bû: navê wan dişibe gotîna hindawropî “mendala”, ku tê maneya him “welat” û him jî “netewe”.

Sala 2300î B.Z. — nîveka pêşin a hezarsalîya II berî Zayînê

Li der û dorên Zagrosê û Tavrê, li bestên Mesopotamîyayê û rêzeçiyayên Îranê hûrî dijîn, ku zimanê wan, bi texmîn, yek ji zimanên koma bakur-rohilatê ya malbeta zimanên Kavkazê ye. Hinek êlêmêntên hûrîyan di navên eşîretên kurdên ku îro li Kurdistanê dijîn hene, lê ewana nikarin bêne hesibandinê wek pêşiyên kurdan.



Selê kevirî yê bîranînê “Serketîna Naram-Suen himberî lûlûbeyan”. Nêzîkî sedsala XXIII berî zayînê. Koleksiyona Louvre

© DIOMEDIA/Granger

Di salên 1894–1595an da berî Zayînê

Hilperîna Asorêstanê. Di encama êrişên zewtkariyê yên Hammûrapî (di salên 1792–1750 da, berî Zayînê) şûmêrî û akkadî ketine nava qiralîyeta Babilonê. Qiralîyeta Babilonê pêşî ji aliyê hetîtiyan (sala 1595an berî Zayînê) hate zewtkirin, lê paşê jî ji aliyê eşîretên hindawropîyan (kassîta) da. Ji nîveka duduyan ya hezarsalîya II berî Zayînê hûrî-sêmîtî cînarên Mesopotamîya Bakur bûn, lê paşê (ji sedsala IX berî Zayînê) eşîretên hindawropî (îranî), ku ji der û dorên kenarên çemê Kaspîyê (Xezerê) bûn, hatine vira. Karê ji hev zêdekirina hespan pêş dîkeve, ku hindawropîyan anîbûn vira: siyarî di şeran da dibin hêzên gelek giring.



Salên 7090–5800 berî Zayînê

Behsa çanda arkêolojîyê ya Cermê tê kirinê, û ev yek bi saya vekolanên li warê Cermo, rohilata bajarê Kerkukê hate dîyarkirin. Di hêla wext da ew di dema gulvedana çandinîyên Neolîtê yên li Çetel-Gûyûkê (Çatalhöyük) û berî wê Îerixonê (Jericho) bûne. Jimara nişteciyan Cermo weke 150 kes bûn. Arkêologê Rûsîyayê S. A. Grîgoryev li ser keramik, erebên darîn, nimûneyên arkîtekturî yên wê demê lêkolîn kir û hate ser wê bawerîyê, ku pêşiyên hindawropîyên tevaya Awroasîyayê li ser axa başûr-rohilata Anatolîyayê û Kurdistanê Rojava, li rex çemê Ferat diman.

Sala 2750î berî Zayînê

Medenîyeta bi cûrê destxeta here kevin li rûbarê dinyayê — ya Şûmêrîyan — li Mesopotamîyayê hatiye dîtin. Ji şûmêran ber bi rohilatê (Îrana Rohilatê) eşîretên ku merivên hev in, ango ji esilekî ne dijîn: elamît, kassît, lûlûbêy û kûtî.

Sala 2400î B.Z.

Hilperîna Qiralîyeta Akkadîyan, ya ku axên şûmêran û semîtên rohilatê (akkadîyan) gîhande hevdu. Cara pêşin navê bajarê Arrapxê bêlî bû, ku eşîretên kûtîyan li rex Kerkuka niha hate avakirin.

Salên 2237–2200 B.Z.

Rêvebirîya padîşahê Akkadîyan Naram-Suen û êrişên wî yên zewtkariyê. Şerên akkadîyan-kûtîyan, êrişa kûtîyan li ser Akkadê.

Sala 2200 B.Z.

Rêberê kûtîyan Êrrîdûpîzîr zora padîşahê akkadan Naram-Suen dibe û li Nîppûra şûmêran xwe padîşah ilan dîke.

Sala 2109 B.Z.

Rûxandîna desthilata kûtîyan û avakirina Qiralîyeta Şûmêrê û Akkadê (binemala Ura ya III). Navê Arbelê (Erbîlê) cara pêşin di nivîsên mixî yên padîşahê Akkadê Şûlgî (di salên 2094–2046 berî Zayînê) da xuya dibin.



Mitani di sedsala XVI berî Zayînê

Sala 1300î berî Zayînê

Navê eşîreta Menda (ji gotina aşûrî "umma manda") di Qanûnên hetîtiyan da tê biranînê. Çend zanyar ser wê baweriyê ne, ku bi êtîmolojî navê "kurmanc" (kurd) — "merivê ji eşîreta Menda", ji navê wê eşîretê çê bûye. Derengtir bi wê gotinê kurd hatine binavkirin.

Sala 1250 B. Z.

Qiralîyeta Aşûriyan Mîtani dagir dike.



Midiya di nîvêka pêşin ya sedsala VI berî Zayînê

Salên 750–620 B. Z.

Menna kirine nava axa dewleta Asorestana Nû.

Sala 612an berî Zayînê


Midiyayî bi hevkarîya farisan Nînevoyê — paytextê Împêratoriya Aşûriyan — zewt dikin.



Alaya padişah Kir II ji binemala Ahemenîdan

Sala 550î B. Z.

Midiya dewleta neteweyên cuda-cuda bû: ya farisan, midiyayan û ermenîyan. Nevîyê padişahê Midiyayê — Astiaga padişahê Fari-zistanê Kir II Midiyayê dagir dike, ku di paşdemê da dibe beşeke dewleta Ahemenîdan.



Sala 1560î berî Zayînê

Eşîretên hûrîyan û sêmîtiyan dewleta Mitanî (Xanîgelbet) bi paytextê Vaşûkanî saz kirin (di salên 1560–1260 da berî Zayînê). Mitanîyan hesp xwedî dikirin û fêrî teknîka çêkirina erebe û fîrxûnan dibûn, ku di şêr da ji şervanan ra serdestî dianî. Bi saya serê wê yekê di salên 1500–1300î berî Zayînê sinorên dewleta Mitanî bi lez dihatine firehkirinê. Padişahên Mitanîyê berevajî hûrîyan û sêmîtan, hindawropî bûn, şerê qiralîyeta Hetîtiyan dikirin, ku axeke mezin ya Asîya Biçûk di bin hukumê wan da bû, û bi Misira kevinare ra yekîti saz kirin. Yekîtiya di navbera Mitanîyan û Misira kevinare da bi zewaca di navbera binemalan va hate xurtkirinê. Gorî versyonekê, qiralîça Misirê Nefertiti, jina ferewun Êxnaton (Amenxotepê IV) bû, ku bi esilê xwe va ji Mitanîyê bû.



Nefertiti
Staatliche Museen
Preussischer Kulturbesitz
(Ägyptisches Museum und
Papyrussammlung), Berlin
© DIOMEDIA/SuperStock RM

Sedsala X B. Z.

Li herêma dora çemê Ûrmîyê ji eşîretên Midiyayê, ku ji Asîya Navîn an jî ji der û dorên Kavkaza Bakur hatibûn, dewleta Menna (qiralîyeta Menna) ava dibe.

Sala 672an berî Zayînê

Serhildana eşîretên Midiyayê (eşîrên hindawropîyê) bi serokatîya rêber Kaştarîtu (dîrokzanê Yûnanistana kevin Herodot wê bi nav dike wek Fraort) diji hukumê padişahên Aşûriyan. Eşîretên kimmêriyan û skîfan piştgirîya serhildanê kirin.

Sala 670î berî Zayînê

Damezirandina Padîshahtîya Midiyayê.

Sala 539an B. Z.

Ahemenîdan Babilon zewt kirin. Arbela (Erbîl) dibe beşeke dewleta Ahemenîdan.

Sala 520î B. Z.

Cara pêşin navê eşîreta Kordî di berhemên dîrokzanê Yûnanistana kevinare Hekatei Miletus da tê biranînê.



Korduena

Korduena (Corduene) (*bi kurdî: Kardox. — Not ya redaktor e*) — herêma dîrokî di nava axa Împêratoriya Romayê da, di nava çavkaniyên ereban yên di demên derengtîr da herwiha bi navê Cizîre jî tê biranîn, paşê (di sedsala XIX da) — Mîrîtiya Botanê û Mîrîtiya Hekkarîyê.

Sala 60î berî Zayînê

Korduena (Kardox) kete nava axa Împêratoriya Romayê

Sala 226an ya dewrana me

Cara pêşin em rastî navê "kurd" ("kurdan") tèn — di salnivîsara bingehdarê binemala Sasanîyan Erdeşîr Papakan da.



Faravahar — sembola bingehîn a Zerdeştîyê di Împêratoriya Sasanîyan da.

© DIOMEDIA/Stefan Auth

Sala 387an

Beşeke Mesopotamiya Bakur dikeve nava Împêratoriya Sasanîyan. Dînastiayên kurdan yên serbixwe têne avakirin: Bazikanî, Deysemî, Himdanî.

Sala 651ê

Hilweşîna Împêratoriya farisan ya Sasanîyan. Di rûyê zevtkariyên xelîf Omer da herêmen kurdan ketine bin destê ereban.

Sala 653an

Serhildana kurdan li Dînewarê.

Salên 359–360


Padîşahê Sasanîyan Şapur II bajarên Amîdê û Bezabdê (Cizîrê) dorpêç kir.

Sala 637an

Destpêka dagîrkariyên ereban. Pevçûnên eşîretên ereban û kurdan nêzikî Hilwanê.

Sala 685an

Serhildana kurdan li Hilwanê.



Sala 401ê B. Z.

Dîrokzan û serleşkerê Yûnanistanê Ksenofon di berhema xwe ya bi navê "Anabazîs" da behsa kardûxan dike (eşîretên mêrxas ji dor û berên rêzeçiyayên Zagrosê). Bi gotina Ksenofon, kardûx tîravêjên bêhempa bûn.

Sala 331ê berî Zayînê

Şerê li rex Gaugamelayê nêzikî Arbelayê (Erbîlê). Di wî şerî da Aleksanderê Makedonê bi awayekî serketî zora padîşahê Farizistanê Darîyus bir û dewleta Ahemenîdan têk bir, hilweşand.

Sala 280î berî Zayînê

Axên kurdan ketine nava Împêratoriya Seleukîdan ya helenîstan, ku li ser kelefeyên Împêratoriya Aleksanderê Makedonê hate avakirin.

Salên 250î B. Z. — 270î D. M.

Beşeke herêma dîrokî ya eşîreta kardoxan — Korduena — dikete nava axa Partî, ku di wan deman da Partî, Împêratoriya Romayê û Ermenîstana kevinare axa xwe dihesibandin.

Salên 700–705an

Kurd bi awayekî xurt tevî serhildana herîciyan li Şapûrê ya dijî Xelîfatê dibin.

Sala 702an

Serhildana kurdan li herêma Saburê li Farsê.

Sala 767an

Serhildana kurdan li Hemedanê.



Ebû Henîf ed-Dînawerî (828–896)

Li herêma Dînawerê li rohilata Kurdistanê ji diya xwe bûye. Li Îsfahanê, Kufê û Besrayê matematîka, poeziya (helbestvanî), astronomî û mekanîka xwendîye. Tê hesabandin wek bingehdarê botanîka ereban (xudanê berhema "Kitêba nebatan"). Bi esilê xwe va kurd bû, kitêba derheqa xuliqandina gelê kurd ya bi sernavê "Ensab el-Ekrad" nivîsiye.

Salên 906–907an

Serhildana eşîretên kurdan Celalî û Hezbanî bi serokatîya Muhemed ibn Bîlal li Mûsilê û eşîreta Humeydî li herêma Cebel-Dasin ya dijî Xelîfatê.

Salên 951–1174

Hukumdariya binemala Şaddadiyan li Ermenîstana Rohilatê û Pişkavkazê.

Sedsalên VIII–X

Belabûna îslamê di nava kurdan da.

Sedsala IX

Axên kurdan dikevîne nava axên Xelîfata Bexdayê, ku binemala Bûdan ya şîîyan hukumdarî lê dike.

Sala 1046an

Oguzan (sêlcûkîyan) Kurdistanê Başûr-Rohilatê dagir kirin.

Sala 1120

Damezirandina parêzgeha Kurdistanê li Cebelê û Baharê bi serokatîya Suleyman-şah Eyubî.

Sala 847an

Kitêba derheqa kurdan da a pêşîn hate nivîsar. Ebû Henîfe ed-Dînawerî (826–896), zanyarê kurd, botanîk û dîrokzan, xudanê salnivîsara "Xuliqîna kurdan" ("Ensab el-Ekrad"). Niha ew kitêb windabûyî tê hesabandin.

Salên 961–1015an

Hukumdariya binemala kurdan Hesenweyhîyan ya ji eşîreta Bazîkanî. Desthilatdariya Mir Bedir ibn Hesenweyh belavî ser axên Îrana Rojava û Mesopotamiya Jorîn bû: Dînawarê, Şehrî-zûrê, Kêrman-şahê, Xûzîstanê.

Salên 985–1085

Hukumdariya binemala kurdan ya Merwanîyan li Diyarbekirê. Şerê bo axê bi Împêratoriya Bîzandî ra.

Sala 839an

Serhildana kurdan li Mûsilê bi serokatîya Cefer ibn Ferecîs.

Sala 1169an

Bingeha Mîrîtiya Erdelan hate danînê.

Sala 1171ê

Bingehdanîna binemala kurdan ya Eyubîyan.

Sala 1174an

Selah-ed-dînê ji binemala Eyubîyan dibe sultanê Misirê û Sûriyê.

Sala 1187an

Salah-ed-dîn zora xaçgiran bir û Quds zeot kir.


Sala 1231ê

Destpêka êrişên mongolan li ser axên kurdan.



Artêşa Salah-ed-dîn (Eyubîyan). Şirovekirin-azîrûkirina destnivîsê, sal 1337.

© DIOMEDIA/Granger



Xelîfata ereban di bin hukumê Saleh-ed-dîn da.

Sedsalên XV–XVI

Mîrîtiyên nîuserbixwe tene avakirinê bi saziyên rêvebirinê û bi leşkerên xwe va. Hilweşîna Împêratoriya Tîmûryan, êrişên eşîretên tirkan Ak-Koyunlu û Kara-Koyunlu ser Kurdistanê. Sazkirina Konfederasyona Ak-Koyunlu bi serokatîya Uzun-Hesen.

Sala 1350î

Êzdîtî bi fermî bû ola Mîrîtiya Botanê.

Sala 1386an

Şerê kurdan bi artêşa Tîmûr ra li rex Amîdonê.

Sala 1399an

Bingeha Mîrîtiya kurdan Soran hate danînê

Sala 1395 – sedsala XV

Kurdistan kete bin hukumê mongolan.

Sala 1470î

Kurdistan dikeve di bin hukumê eşîreta Ak-Koyunlu.

Sala 1501ê

Serketina binemala Sefewîyan li Farizistanê.

Salên 1506–1510an

Serhildana êzdîyan bi serokatîya Şîr Şerîm diji desthilatdarîya Şahê Sefewîyan Îsmail I li Kurdistanê.

23ê tebaxê sala 1514an

Şerê Çaldiranê. Artêşa Osmanîyan zora Sefewîyan bir û dest bi perçekirina Kurdistanê bû di navbera du dewletan da: Farizistanê û Împêratoriya Osmanîyê. Şerên Farizistanê-Tirkîyê. Beşa pir a axên kurdan dikevîne di bin hukumê Împêratoriya Osmanîyê.

Salên 1609–1610

Parastina kela Kurdan a Dimdimê, a ku ji hêla Sefewîyan ve hatibû dorpêçkirin. Hewildana damezirandina Mîrîtiya kurdan a serbixwe li Soucbûlakê (Mehabad) bi rêberîya Emîr-xanê ji eşîreta Mukrî.

Sala 1655an

Li Bitlîsê Ebdil-xanê ji eşîreta Rojkîyan serhildana diji Împêratoriya Osmanîyê tevradike.

Sala 1639an

Peymana Zohabê (Qesrî Şîrîn): kişandina sînorên di navbera Împêratoriya Osmanîyê û Farizistanê da.

Salên 1590–1616

Dema serokatîkirina Xalo — Xanê Erdelanê.



Alaya binemala Zend

Salên 1751–1779an

Kerîm-xanê Zend dibe hukumdarê Farizistanê. (Derheqa esil û esasê Kerîm Zend da fikirên cuda-cuda hene: piraniya zanyarên îroyîn dibêjin ku ew lûrî ye, lê di belgeyên arşîvan da ew wek kurd tê binavkirin).



Kurdistan wekî beşek ji Împêratoriya Osmanîyê. Sal 1823

Salên 1756–1791an

Xusraw-xanê II serokatî li Erdelana Mezin dike.

Sala 1821ê

Bedirxan dibe Mîrê Botanê.



Salên 1535–1536

Sirgûnkirina kurdan ji herêmên ser sînor ber bi herêmên merkezî yên Farizistanê di dema serokatîya Şahê Sefewîyan Tahmasîa I. Mihacirîya kurdan ber bi Azîrbêcanê, paşê jî Xorasanê.

Sala 1555an

Li Amasîyayê Peymana Tirkîyê-Îranê hate girêdan, ku gorî şertên wê beşeke pir a Kurdistanê kete nava axa Împêratoriya Osmanîyê, lê Kurdistana Rohilatê — nava axa Farizistanê.

Sala 1597an

Şeref-xan Bitlîsî berhema xwe a "Şeref-Name" dinivîse derheqa eşîret û binemalên kurdan yên binavûdeng da. Di vê berheme da xudanê wê didema Mîrîtyên kurdan tîne ber çavan, ku di bin destê Împêratoriya Osmanîyê da bûn.

Sala 1695an

Ahmedê Xanî destana "Mem û Zîn" dinivîse.

Sala 1699an

Serhildana Mîr Suleymanê Babê li Başûr-Rohilata Kurdistanê (Babanê) diji Împêratoriya Osmanîyê.



Alaya Mîrîtiya Soran (1816–1835)

Sala 1818an

Mîr Mihemed xwe wek rêberê serbixwe yê Mîrîtiya Soranê îlan dike.

Salên 1804–1829an

Pêwendîyên pêşin yên Împêratoriya Rûsiyayê bi kurdan ra di dema şerên Rûsiyayê-Tirkîyê û Rûsiyayê-Farizistanê da. Di çavkanîyên rûsan da kurd hinek caran wek "kûrtî" tîne binavkirin.

Salên 1829–1842an

Mîsyonerên xaçparêz yên Awropayê bi awayekî aktîv ketine ci û warên Kurdistanê. Pevçûnên li ser bingehê olî di navbera kurdan û aşûrîyên xaçparêz da li Kurdistanê.

Salên 1833–1834an

Êrişên zevtkariyê yên Mîrê Soran Mîr Mihemed.

Salên 1834–1847an

Cara duduyan dagirkirina Kurdistanê ji hêla Împêratoriya Osmanîyê da. Serhildanên Mîr Mihemed û Mîr Bedirxan.

Sala 1836an

Ji holê rakirina serxwebûna Mîrîtiya Soran.

Salên 1854–1855an

Serhildana Yezdanşîr li Hekkarîyê û Botanê.




Mîrîtiyên kurdan di sala 1835an da.



Ubeydullah Nehrî (1829–1883)

Şêxê (rêberê ruhanî) Biratîya sûfîyan — Neqîşbendî, rêber û serokê serhildana bona damezirandina Kurdistanê serbixwe. Bûye qumandarê şervanên kurd di dema şerê Rûsîyayê-Tirkîyê yê di salên 1877–1878an da. Weke 60 hezar şervanên çekdar di bin hukumê wî da bûn. Navbenda serhildanê Ûrmîye û Soûcbûlak (Mehabad) bûn. Şêx Ubeydullah bi awayekî aktîv hewil dida piştgirîya dîplomatên welatên Awropayê û nişteciyan herêmê yên ne musulman werbigire, lê leşkerên Împêratoriya Osmanîyê serhildana kurdan têk birin, lê Ubeydulla bi xwe sîrgûnî Hîcazê kirin.



Sala 1898an

Li Qahirê destbi weşandina rojnameya "Kurdistan" ya bi zimanên kurdî û tirkî dibe.

"Kurdistan" – rojnameya kurdî a pêşîn. Sal 1898.

Sala 1880î

Serhildana Şêx Ubeydullah bi armanca damezirandina Kurdistanê serbixwe.

Sala 1908an

Şoreşa Contirkan li Împêratoriya Osmanîyê.

30ê çileyê pêşîn sala 1918an

Li Stembolê bingehê Komeleya Vejîna Kurdistanê (Kurdistan Teali Cemiyeti) tê danîn, bi armanca ku dewleta kurdan a serbixwe bê damezirandin.

Sala 1912an

Li Tirkîyê bingehê Komeleya kurdên welatparêz ya bi navê "Hîwa" û li Îranê — "Gehandini" tê danîn.

Sala 1914an

Serhildana Şêx Selîm li Bitlisê û Şêx Ebdul Selyam Barzanî li Mûsilê bi daxweza damezirandina otonomîya kurdan.

Salên 1915–1916an

Leşkerên rûs Kurdistanê Îranê zevt dikin.

Sala 1905an

Şoreşa Konstîtûsyon li Îranê, tevrebûnên dijî zordestîya Şah.

Meha çiriya paşîn sala 1914an

Tevbûna Împêratoriya Osmanîyê di şerê Hemcihanê yê yekê da.

Sala 1915an

Gelkujîya ermenîyan li Împêratoriya Osmanîyê.